

Agahdarî (Înformasyon) ji bo bikaranîna Pirtûkxaneya Şaredariyê

1. Hûn bi xêr hatin Pirtûkxanê

Hûn dikarin Pirtûkxaneya me bêpere zîyaret bikin. Û hemû Pirtûk, CD an jî medyayên din di avahîyen Pirtûkxanê da bêpere ji bo bikaranîne di xizmeta we da ne.

Ger hûn bixwazin ji xizmetên me yê din jî sûtê werbigrin, dibê kû karta we ya Pirtûkxanê hebe.

Hûn dikarin bi Karta Pirtûkxanê:

- Medyayên me bibin derva (dêngirtin), an jî bibin mala xwe û dema girtina medyayan bixwe dirêj bikin.
- Cihê runiştinê û bikaranîna Internetê, û bikaranîna hacetên din wek Computerê
- Karûbarê Onlinê bikin, wek mînak E-Pirtûkan daxinin xwarê li ser hacetên xwe.

2. Qeydkirin (Amaddarkirin)

Ji bo wergirtina karta Pirtûkxanê, pêwîste hûn xwe qeydê Pirtûkxanê bikin. Qeydkirin tenê bi kesayetî ya we bi xwe tê çêkirin. Karta Pirtûkxanê tenê bi xwedîyê kartê tê bikaranîn û hûn nikarin karta xwe bidin kesekî din. Ger karta we bê destûr were bikaranîn û tiştek nebaş pê çê be, ji vê yekê xwedîyê kartê mesûl e.

2.1 Ewraqên pêwîst

Kerema xwe ji bo qeydkirinê van ewraqan nîşanê me bikîn (bînin)

- Ji bo Mezin û Cîwanan

Îsbata Kesayetî (wekî Pasaport, Îcaza Lêmanê, Nasname)

Îsbata Navnîşanê (wekî îsbata îqametgehê, ewraqên navnîşanê)

- Ji bo cîwanên kû nasname an jî pasaporta wan tûneye

Dibê kû an Nasnama Dibistanê, Ewraqêkî ji Dibistanê (tenê ewraqên wene, resm liser in) an jî kopyekî nasnama kesêkî mafê xwedîkinê lê ye hebe.

Ji bo zarokên di bin 18 salî da ne, mesûlîyetê kesê kû mafê xwedîkirinê lê ye dide ser milên xwe û ji bo vê jî imzayê daveje.

2.2 Mesref

Hûn dikarin li ser malpere me agahîyên zêdetir di derheqê mesrefan de bigrin.

2.3 Wendakirina karta Pirtûkxanê û jibîrkirina nasnamê

Ger we karta xwe wendakir, kerema xwe zû Pirtûkxanê agahdar bikin.

3. Internet

Internet di Pirtûkxanê de bêpere di xizmeta we da ye. Kerema xwe ji bo agahîyên berfireh karmendên Pirtûkxanê bipirsin.

4. Bikaranîna medyayan (Pirtûk, CD, DVD) li dervayê Pirtûkxanê

4.1 Dênkirin

Dênkirin (wekî Şundadayîn jî) li ser hacetan çêdibe. Hacêtên dênkirinê û hacêtên şundadayînê li hemû qatan heye. Ger hûn nebînin karmendên Pirtûkxanê alîkarî li we dikin.

Ji bo dênkirinê û birina medyayan ji bo derve pêwîstî bi karta Pirtûkxanê heye, dibê karta we hebe. Dema we medyayan bi dên girt, wê belgeyek (şanname) bikeve destê we. Li ser vê belgê dema şundadayînê dinivîsîne, ka hûn çend hefteyên din medyayan şûnda bidin.

4.2 Midetên Dênkirinê

Midetên dênkirinê ya pirtûkan, cd'yan û dvd'yan ji hev cûdatirin. Nexşek (Listeyek) midetên dênkirina medyayan li ser malpera me li ser Internetê ye. Kerema xwe li wir binêrin û berîya hûn medyayekî dên bikin, lê mêzebikin, ka hemû tişt li cîhê xwe ne û pirtûk başin û di rewşekî xirab de nînin. Dema we tiştê nebaş dît, ji karmendên Pirtûkxanê re bibêjin. Medyayên we dênkirîye nedin kesên din, ji ber kû ev yek qedexeyê ye.

4.3 Şûndadan

Her medyayek we dênkir, pêwîstê di dema xwe da ji bo şûndadanê were Pirtûkxanê. Hûn dikarin dema şûndadana herî dawî li ser nexşeya midetên dênkirinê û li ser Kontoya xwe bibînin.

4.4 Dirêjkirin

Eger sebebekî tune be, hûn dikarin midetên dênkirinê berîya ev midet xilas be dirêj bikin. Dirêjkirina midetan bi rîya Telefonê, an jî rîya karmendekî Pirtûkxanê mimkûn e. Hûn dikarin li ser Internetê bikevin kontoya xwe û li wir jî dirêjkirin mimkûn e.

4.5 Mesrefên derengdanê / zerardana medyayan

Dema we medyayan di dema xwe da şûnda neanî, dibê kû hûn mesrefên şûndadanê bidin. Ji bo agahîyên berfireh di derheqê mesrefan de kerama xwe li malpera me ya Internetê binêrin. Dema hûn medyayan şûnda nedin, ev yek bi cezayên pere tê ceza kirin. Dibê kû cîhê medyayên wendakirî an jî xirabkirî ji aliyên Dênkar ve were tijî kirin. Ev yek jî bi mesrefan ve girêdayî ye.

5. Agahîyên giştî

Karmendên Pirtûkxanê dikarin çente, torbe an jî qutîyên mezin ji we bixwazin. Ji ber kû ev tiştên mezin di avahîyên Pirtûkxanê de pir cîh digrin û hûn dikarin tiştên xwe, çente, torbe, qutîyên mezin bidin derban (Gardirobê) ji bo kilîtîkirinê. Ger tiştên we werin dizînin an jî hurkirinê mesûliyê li ser we ye. Kerema xwe dema sekinandina li Pirtûkxanê bêdeng bin û hûrmetê li kesên din bigrînin û kesî eciz nekin. Kesirandina kesên din û anîna heywanan qedexeyê ye. Xwarin û vexwarin tenê li cîhên kû destûr heye serbest e. Kerema xwe tehlîmatên karmendên Pirtûkxanê bicîh bînin.

Agahîyên berfireh li ser Darve, Palkêrt û Nîzama Malê (Rêzana Malê) ne.

Ji bo Lêpîrsîn, Pîrsyarên we yê din hemû xebatkarên me di xizmeta we da ne.